



AZADI

Rojnameya Hefteyi ya Nûçeyî O Şiroveyî

Jimara taybeti
ya Newroz'ê ya
Rojnama
AZADI ye.
Bê pereye

NEWROZ PIROZ BE

BETI NEWROZ





NEWROZ

ROJA BERXWEDAN, JİYAN Ü ŞAHİYÊ

Newroz jumer bi çi mane

Qedrê wê ji xeyni Kurdan ki dizane

Şairan henav sutandin bi gazi ne
Kurdno rabin ev çi hal e.

Newroz, ew roja piroz cejna azadixwaza
Dengê rêncher û jar û belengaza

Agiran geşkin seranser li çiyan
Deng bidin ba seh bike tev cihan

Newroz agirê azadi, lê welat iro bendewar
Roja nû rizgari û şadi, ku em dîbin hextewar

Iro ji, me KAWA û FERİDÜN pir hene
Jî axa Kurdistan hêvidar li benda me ne

Gola Wanê, ya berin wek asiman kesk û şin
Bi hezaran jar û reben wek sêwîyan, bêkes dijin

Newroz e ku meha Adarê me dike şâ ye
Kurdan di rêya rizgari da pir şehid daye

Newroz bû ku şehid ket di himbêzê Helepçe
Lê disan ne rawesta, tevger û ceng, li navçê

Karê me Kurdan tekoşin e, şev heta rojan
Ev rêyek pir çetin e, bi dûlsozi û ferman

Ne bes e 2605 sal, ev bar û sitem
Bes dibêjim, hûşyar bibin ji vê xewa kem.

Iro êdi dewletek me heye, em gelek şâ ne, pê dilxweş in
Kurd hemi rabin piya bo yekiti binieşin.

Dî tarixa Kurdistanê da, Newroz bî gelek mane tê zanin. Maneya mitologik ya Newrozê na, lê hemû maneyên dîn, netewi û serketinê nişan didin. Wek dizanın Newroz cejnek navçehi ye ku ne tenê Kurd, lê her weha Fars û Belûc, Efgan ji Newrozê weki cejn, heftiyek piroz dikin û bî çavek miri Newrozê dîbinin. Baştırın Newroz li Kurdistanê tê pirozkırın. Lewra, li gora dirokê bûyera roja nû (newroz, nûroj) li axa Serdariya Medan, angò li bajêrê Ninowa derbas bûye. Bî navê Dehaq serdarek -ku dîbêjin bî eslê xwe Ecem e- ku gelek zâlim û xedar bûye, êşek girtiye ku li hemû cihanê hekiman nekarine ji êşa wi re derman û çareyek bîbinin. Li dawiyê hekimek mix û mîjiyê mirovân ciwan bî derman pêşniyarê Dehaq kiriye, ku li gora vê pêşniyarê dîvê mixê mirovan derxin û daynîne ser sermîlê Dehaq û paşê ji marek wi mixê teze bîmije û her weha kunêra sermîlê Dehaq ji der bibe û idap û êş û jana bedena wi jê derê. Ferman daye Dehaq ku her roj xortek bê serjêkirin û mixê wi bikin derman. Qisasê Dehaq, mirovek ne xîrab bûye. Wi di şûna xortan da pez serjêkiriye û mixê heywên pêşkêş kiriye. Lê haya quesra Dehaq ji vi tiştî nebûye. Xorten ku dîhatin bo serjêkirinê ji, xwe veşartine û ji bajêr çûne serê çiyan.

Ev rewşa hanê bî mehan dom kiriye, li dawiyê, li welat kesen xort kêm bûne. Kawa hesinkarek xebatkar bûye. Cellad û qisasê Dehaq hatine ku Kawa yê hesinkar ji bîbin. Kawa ji, bîyar daye ku here quesra Dehaq, wi bikuje û müillet ji vê zîlmê rizgar bike. Çakûçê xwe ji dî bin pêştemala xwe da veşartiye û li gel qerewila çûye qesrê. Qerewilan Kawa teslimi qisasan kırıne. Kawa berê ji li gel xorten çiyê şewra xwe kiriye ku dema çû serjêkirinê wê Dehaq bikuje. Dema ku wi kuş wê li serê banê qesrê agurek vêxe, dema ku li ser banê quesra Dehaq agir vêket, bîzanın ku Kawa serketiye û hemû xort ji çiyê werine bajêr.

*Kawa bû ew roj rakir ala Kurdan
Bo dûweroj çakûç bilindkir bi destan*

*Kurd û Belûc û Efgan û Irani
Her yek ji wan Newrozê cejna xwe zani*

*Kawa rabû ji axa Medan; ji me re bû pêşeng
Ew roj û ev roj, Kurd her li pê ne, dikin şer û ceng*

*Bî hezaran jin û mîr şehid in li goristan
Zêdetir serok û rêber bûn bo axa Kurdistan*

*Dî destek da pêta agir, li yê din qelem
Nebin dest vala, ku nemine êş û elem*


*Jî gerdena Kurd bîşkînîn nirê zîlmê
Îro ye roja felat, dereng nemini stbê*

*Dehaqê xwinxwar, mîjîyê Kurdan dixwar
Îro ji Dehaq pîr in, bî zîlm û zor sitemkar*

*Bî das û çakûç û qelem û şûr
Ala azadiyê li burcan kin li bakûr.*



*Agir û govend, agir û şahi, agir û hêvi agir û azadî. Dî jiyana Kurdan de agir ciyek
gelek giring digre. Lewra agir Remza azadiyê ye. Lewra agir Nişana Newrozê ye.
Agir sembola serketin û hêza berxwedanê ye. Kur dî Newrozan de li dor agir dici-
vin, bî diruşm û şiar û govend û dilan, car dikenin car ji qewlê, serhildanê dikin.*



Di van salê paşî de, gelê Kurd baştûr hişyar bu û li doza azadiyê xwestûr xwedi derket

Kawa lı qesra Dehaq:

- Ez dîzanim hûnê mîn ji bîkujin, lê tîkaye ez dîvêm ku dî axîrin dema jiyanâ xwe da serdarê welat bîbinim.

Dergevan:

- Bo çî Kawayê hesînkar.

Kawa:

- Dîxwazîm serdar bîbinim, lı gel mijûl bîbim.

Dergevan:

- Nabe, ditina serdar qedexe ye.

Kawa:

- Lî mîn salîx daye ku dermanek birîna serdarê me heye, ezê wi dermani jê ra bêjîm û vegerim.

Dergevan:

- Wîsan e ez serdar agadar bîkim, eger te qebûl bîke, fermo were, here cem serdarê mezîn.

Kawa:

- Baş e ezbeni.

Dergevan dîce xwesteka Kawa radîgêne Dehaq. Dehaq ji vê gotûbêjê qebûl dîke, lı dawiyê destûr dîde ku Kawa were diwanê.

Dergevan:

- Baş e Kawayê hesînkar were destûr heye ku tu heri cem serdarê bîlind.

Kawa bî kîf û seyran dîce ber deriyê diwanê û dema deri vedîbe dîce nêzikê Dehaq.

Dehaq:

- Ca were bîzanîm bendeyê mîn, te salîxê çî dermani ani jî bo mîn.

Kawa:

- Ez im, ez Kawayê hesînkar im Dehaqê zalîm, dîbêje û pê ra çakûçê xwe jî bin pêştemala xwe ya kesk û sor û zer dertine û êrişi Dehaq dîke.

Dehaq:

- Ev çî ye, kuro tu din i, qerewilno de zû werin bîgrin bîkujin, hewar, medet, ev mirovê din serdarê xwe dîkuje.

Lê tu kes nayê hewara Dehaq. Kawa bî çakûçê xwe serê Dehaq dîperçiqine û paşê ji dîce serê banê qesrê agirek geş vêdixe. Dema xortêni ciyê agîrê serê banê qesrê bîbinin, pê ra hemû têne bajêr û herkesek bî rojan cejn û seyran û dilan dîke. Ev roj rojek teze ye ku jê ra gotine Roja Nû, Newroz, Nûroj, Nûroz, Rojinewe...

*Li rojhilat û Iran û Kurdistan
Bû kîf û xweşî, şadi û seyran*

*Roja destpêka jiyanek bextewer
Kurdno yekbin, ji hey nebin bêxeber*

*Dehaq dit ku bi zor û zilmê Kurd namurin
Ma êdi ne bes e qey kuştin û serjêkirin*

*Çemê Qerdil, Derahenê, Rewandûz û Qamışlo
Mehabad û Silêmani, ne bêçar in weki do*

*Rabe êdi şer û qirên, birakuji, berberi
Govend bigrin bi birati, ji vi ser ta wi seri*

*Sed heyf û mixabin ku Kurd wiha bindest in
Li çar ali dij û neyar, Kurd bo wan kemerbist in*

*Gelek sêdare dani dijmin, wek Amed û Çarçira
Bêhisab hatin kuştin, gelek kes xwişk û bira*

*Newroza çend sal berê, Kurd li pê bûn li her derê
Bi govend û dilan, agir û seyran, ji malan hatin derê*

*Ji hêza Rom'an, postal reşan, neyarêñ qewmê Kurdan
Bi çavşori, wa bê iman, gülleyan kırın baran*



Newroz... Caran agirê serê çiyan, caran şahi û govenda deşt û geliyan, Bi biratî û dilsozi, keç, kur, jin û mîr li hey dicivin kîf û seyran dikin li deşt û baniyan.

*Ka welatê ku Med lê dibûn sitar
Ku kuştin Dehaq, ji zilmê bâne rizgar*

*Em Kurd in, şin û şahîyan bi hev ra dikin piroz
Lewra cejnek bi miraz e ji bona Kurdan Newroz*

*Her Kurdek, ta ku Kurdistan wiha li bin dar e
Ji roja zayin hetani mirin, hemû rojan bi bar e*

*Newroz e ku dil, cehd dike, bîşkêne qeyd û zincir
Bo azadi, ji nirê zorê, keç û xort, ciwan û pir*

*Li Cizira Botan, zarokan singan dan ber tanqan, li pişt wan Bircabelek
Bî mîrxasi hatin kuştin gelekan, reş bextê wan, xain bû ew roj felek*

*Wek Mestûre Xanum, Zarife û Besê, Margüret û Leyla Qasim bin jin
Mil bî mulên birayên xwe, ger nekin xebat tu cari azad nabin*

*Newroz e ku daye me, hiş û bir û raman û hêz
Cepheyek pêkbinin, di nava wi bibin rêz*

*Ala Kurdan bîzanin rengê xwe, çi mane ye ew kesk û sor û zer
Ewil kawa daye ber xwe, paşi Qazi wê nişan kir bo zafer.*




Di demek ji şeqamên Kurdistanê. Hêza dagirkera dewleta Türk, bi ser gelê Kurd va gülleyan dibarine. Debabe wek gurê har, erd û axa Kurdan di perçiqine, zarukan bi dirindehi dikuje. Lê di Newrozan de gel, bêtur hêrs dibe li humberê zordesîya Dewleta kolonyalist.



Sal 1992. Newroz... Cizira Botan. Piçuk, mezin, kal û ciwan herkesek ji malan hatiye der. Beyanek zu, bi këf û seyran herkese ber bi qada şahiyê ve dimeşe. Kurdên Cizira Bota, carêk din berxwedanê bi birtinin, hikm û bandura dewleta zordest riswa dikan, bi dilsozi daxwaziya azadiya xwe dikan. Dijmin bi vê rewşa çevsor dibe û êriş dike ser xwepêşendera. Li dawiyê nêziki sed kes kuştî ewqas ji birindar.

Diyar e, bi bûyera Newroz em baş fêm dikan ku, Kawa Kurd bûye, ciyê vê bûyerê ji iro pirani Kurdistan e. Lewra bûyera Newrozê ji bo Kurdan bûyerek milli ye, angó Newroza Kurdan cejnek netewi ye. Weki din ji, roja ku millet ji zîlma Dehaq rizgar dibe, ew roj dibe rojek xweş, rojek teze ku gelê Kurd pê këf û seyran dike. Kurd, vê rojê ji xwe ra piroz hisab dikan ku ev ji heqê wan e.

Jî aliye ki din va ji, Kawa mirovek xebatkar bûye. Ew xebatkar cehd kiriye ku hemû millet ji zîlmê rizgar bîke. Lî dawiyê wisan ji bûyê. Ango, rizgariya millet wê demê bi pêşengiya xebatkaran pêkhatiye û zêdetir xort û ciwan vi tiştî bi serxistîne. Xuya ye ku, maneyek çinayeti (sınıfı) ji di bûyera newrozê da veşartiye. Disan çawan ku tê gotin ger Dehaq bi eslê xwe Ecem yan ji Ereb be, Kawayê Kurd lî diji zîlma biyaniya seri hilda ye û li gel piştgiriya gelê Kurd, kutayı bi'seltenetê serdarek biyan anije. Bê guman Newroz cejnek milli ye û wê her weha ji bê zanin. Jî ber ku Newroz cejnek milli ye, ne tenê xebatkar û karker, lê hemû çin û rêzên Kurdayeti



Cizira Botan, ciyek piroze. Dî diroka Kurdistanê da gelek caran Kurdên navce li dijî zilmiê li berxwedane û serhildane. Lê dijmin bi hemu hêza xweva, hertum xwestiye ku bi kuştin serhildana Kurd têkbîşkine. Iro ji Kurdistan hê bindest e. Lê ji bo azadiyê li pê ye. Çare nine rojek wê Kurdistanâ azad û demokrat çê be û ciyê xwe bigre li nav cihanê. Em bi gelê xwe bawerin û dizanin ku tu tiştek xwe li ber hêza gel ranagre.

dî bûyera Newrozê da şirik in. Anglo beg û axa û xebatkar û jîn û mîr û pir û ciwanê Kurdistanê bî ruhek milli Newrozê hîmbêz bikin, bî ci ye. Her wiha ne tenê Kurdên li ser axa Kurdistan, lê hemû Kurdên cihanê heqê wan e ku cejna xwe bî dîlşahi piroz bikin.

Jî roja ewl û hetani iro li gelek cihê cihanê, bî taybeti li Kurdistanê her sal roja 21'ê Adarê wek cejnek se-ranseri Newroz bî bireweri hatiye pirozkırın. Lê xasima li Tûriyê, dewlet li hîmber vê bûyerê xwe bihnteng kîriye û gelek cari dî vê babetê da tedahi kiriye, girtin, zîndan, zîlm û zordesti her karê dewletê bûye. Dî van salêna paşi de kuştin ji tev li dijayedîya dewleta Tûr bûye.

Dî dever û astengêngiştî da ku Kurd mical û fersendê nedîne li welat Newrozê piroz bikin, Kurdên dervayê welat vi kari bî camêri pêk anîne û her sal cejna Newrozê wek rojek piroz li gelek ciyê dervayê Kurdistanê hatiye pirozkırın.

*Kurdên dervayi welat neminun qet bê xebat
Doza Kurdan bîdin nasin, li darva bikin lebat*

*Qet nebin bê deng, sist û teral û xewar
Li cihanê deng bîdin, bi merdi bikin hewar*

*Nebêjin ku rewşa me xwes e, me çi ji Kurdên welat
Ger Kurdistan rizgar nebe, hûn ji nabinun felat*

*Dî rojêng teng hewce ye herin hewara dosta
Roja fireh, herkesek mala xwe ye ji mezin ta piçûka*

*Ser heta pê, wa birindar, neminun bêçar û bi xem
Şev ta sibê, weki pîling, bar bizanin, hûn ji her dem*

*Sitar neke zilma qirêj, veqete ji pêşira Kurdan
Bo bizanin gelê cihan, çend mîrxasê Kurd li meydan.*

Kurd Newrozê cejnek netewi û seranseri qebûl dîkin. Lê di halek da ji Newroz sersala Kurdan e. Lî gora rojimêra (salname-teqwim) Kurdan, 21'ê Adarê destpêka salek teze ye. Dî bist û yekê Adarê da roj û şev dibin weki hev. Ev bûyer, beri zayinê destpê dike. 600 sali zêdetir wext heye ku ji vê ji tê kîvşê, tarixa Kurdan gelek kevn e. Dema ku bajêrê Ninowa hate azadkirin, ew ji bo gel rojek piroz bû û wê rojê Kurdan ji xwe ra kirin destpêka tarixê. Piştra ji, -pişti du salan- dema ku Serdariya Medan damezra, ew roj ji bê guman rojek piroz û gûring bû ku hînek Kurd vê rojê bî destpêk qebûl kirin. Hînek lêkolinvan, dirokzan û birewêrên Kurd, fetha Ninowa û damezrana Serdariya Medan, destpêka salnama Kurdan qebûl dîkin. Bî raya wan Kurd du salnaman qebûl kirine. Yek roja azadbûna Ninowa, ya dîn ji roja damezrana İmparatoriya Medan. Ger ev rast be, tiştek eş-kere heye ku pêwist e bêjin salnamê Kurdan bi bûyerên milli destpêdikin. Anglo rojimêra Kurdan milli ye. Roja azadbûna Ninowa di nivê paşi yê meha Adarê da bûye. Lewra ew roj rojek nû ye, her wiha Newroz e. Kurd bi rasti ji divê 21'ê Adarê ji xwe ra sersal qebûl bikin. Lê iro diyar e, cihan zêdetir ber bî yekgirtinê va diçe. Se-dem vê yekê ji, salnama iro ku zayina Isa destpêk qebûl dike, ji bo Kurdan ji ne muşkul e, Kurd ji dikarin pêreviya vê rojimêre bikin ku iro bi giştî wisan e ji.

Sersala Kurdan, li Kurdistanê gelek xweş tê pirozkirin. Zarok malo malo digerin, dîlok û kenoka dibêjin. Weki "Kincik mincik xwedê bîhêle wiyê kuncik / Serê salê, binê salê xwedê bîhêle malxweyê malê / Armûş mermîş xwedê bîhêle wiyê dergûş."

Dî wê demê da, xwedi mal ji xelatan dide zarokan û wan kêfxwes dike. Herkes, ew roj dilxwes û serfiraz e, zarok xelatên xwe tinin malê, bi rojan, bi van diyariyên sersalê kêt û seyran dîkin.

*Newroz e, roja sala teze yê bê guman û bê xem
Xirabi diçe, herkesek hêvidar e, başı tê şâ dîbe alem*

*Dizanîn rewşa iro dijwar e, her êş û jan e
Dî Newrozan da çêtir bibin jîr û zane*

*Newroz cejneki kevn e bi nav û deng e
De rabin ser pê iro ye ev roja ceng e*

*Newroz e sersal e, sala nû baştir e ji par bê guman
Roja bist û yekê Adarê, destpêk e, şev û roj dibin temam*

*Newroz e cejna gelên Ari, li Rojhîlata Navîn
Kurd û Fars û Belûci cejna hev piroz dîkin*

*Hersal meha Adarê cejn e, lê şehidan ji bikin biranîn
Qet jibir nekin, rêya şehidan e tekosîn û zanîn*

*Dibêjim, destûr, Kurdino roj bi xêr cejna we bibe piroz
Qet reşî nebinun, her dilşâ bin, hemû rojên we Newroz*

*Herkesek, ji bo azadi, di deverek de hilgire barek
Ta ku şâ bin, bi hev ra bin, serbilind bin bi carek*

*Car caran dema hatin, rewşa welat hin bibin û bibinun
Êdi bes e vegerin, li derva bê hiza welat neminin*

*Sala teze bi xweşî bê, Newroz bîbe remza xweşî
Tev bi hev ra rabin piya şerek daynûn bi şoreşî*

*Lî beşek welat rizgar bâye, bibin piştevan bo dewletê
Jî car ali Kurdistanê, destbiyek bîgrin dawetê*

Tê zanin ku her salek çar beş e: Bihar, Havin, Payiz û Zîvistan. Her werzek (mewsimek) ji sê meh in. Lê alem ji zivîstanê ne qail e, lewra zivîstan dijwar e, sar e, bî xem û êş û jan e. Roj û şev tari ye, ewrek reş bî ser jîyanê va digre. Mirov bî rewşa zivîstanê dîlxem dibe. Tu kesek reşîya zivîstanê xweş nabine. Newroz, derçûna ronahiyê ye ku jî pêşîra reşî û taritiyê tê der. Anglo meha Adarê -ku lî gelek ciyan dîbêjin meha Newrozê- destpêka bîharê ye. Yani destpêka bîharê, ewîlin meha destpêka xweşiyê Adar e. Berfa ciyan dihele, gul û gulsen têr av dibin, erd rewâ digre, xwin dikale, jiyan diherike, germ dîbe, kîrêti, terali, xewari ji can û bedena jîyanê tê der, beden xwe nû dîke, dîkeve dû jîndariyê.



Diyare, Newroz ji aliyê Pêşmergan ve ji, bî başî û serbulindi tê pirozkirin. Lewra pêşmerge, perçeyek ji gele. Pêşmerge, parêzgerê can û mal û ax û azadiya Kurda-ne. Baştırın piroziya Newrozê bi dest pêşmergan pêk tê.

Bî kurti, dî vê dema salê, dî vê meha bîharê da av dîgîhije kurmê darâ. Lewra, ji bo vê mehê Adar, yani Avdar tê gotin. Roja yekem a bîharê 21'ê Adarê ye. Yani roja Newrozê ye. Gulek wan rojan difeqe ku jê ra dîbêjin Gula Newrozê. Her sal sê caran roj û şev dibin wek hev. Ewilin cara yekitiya şev û rojê 21'ê Adarê ye. Wisan e dîkarin bêjîn ku Newroz destpêka bîharê ye ji. Roja xêrê, roja xweşiyê, roja dawiya dîjwari û reşiyê, roja Newrozê ye. Rojek bextewar û bî bereket e. Roj bîlind dibe li asiman, cihanê germ dike. Mirov xwe didin ber berojan kêf û seyran dikin.

*Govendek bîgrin, yekcari seranser
Bî rîz û rîç û hevkari û bî serwer*

*Newroz agir wîha ges dike li Kurdistan
Jin û mîr keç û xort govend dîgrin bê westan*

*Meha Adarê dema av dîgîhêje qurmê darê
Geş dîbe beden, dîkele jiyan, xwin dîkeve hesarê*

*Reşî dîşkê serdiikeve jiyanek çê
Zivistan diçê, li dû wê bîharek tê*

*Ey Sipan û Nemîrûd û Dicle û Ferat
Roj wê bîn ku azadî be mitzin û xelat*

*Li Kela Dimdim, li birca Amed û li Piran
Li Şîno û li Hewlîr, herkesek bîke seyran*

*Îro êdi erd şêne, bi kesk û zer dîxemiline
Mêrg û çimen bi gulên Newrozê kemiline*

*Newroz e, remza cejn û bîharê, roja serketin
Ji bo Kurdistana azad, keç û xort bi rî kevin*



Dî dema pîrxwedahîyê da, her bûyerek xwedayek xwe hebûye. Weki xwedayê rojê, yê bayê, yê şevê, yê qenciyê, yê xirabiyê û hwd. Dîbêjin ku xwedayê xirabiyê ku parêzgerê zivistanê bû û xulqenarê reşî û nexweşîyê bû, ne dihişt ku millet rûyê xweşiyê bibine, xirabi rabe û millet dîlşa be. Sedem vê yekê, xwedayê qenciyê vi tiştî qebûl nekir û li himber xwedayê xirabiyê şereki dîjwar beyan kîr. Xwedayê xêr û xweşiyê ku berpîrsê bîharê bû û jiyanek xweş dîparast, bî hêz û bîhînfireh bû, kesen ku reşiyê nedixwestin li dora xwe cîvand û paşî êriş bire ser xwedayê xirabiyân. Lî dawiyê xwedayê qenciyân piştî şerek tund û dîjwar serket û bî kutayî rojên reş ani. Millet hemi bî vê roja nû kete kêf û seyranê, lewra gotin ev rojek nû ye, navê wê nûroj e. Ew roj û ev roj, roja destpêka bîharê, ango 21'ê Adarê, roja xilasiya rojên teng û dîjwar tê hisabkirin. Ev roj ji, rojek piroz e, lewra xedari şikestiye, dîlşahi serketiye. Newroz ji aliyê naverokê va ji, bî vi terhi tê şirovekîrin û mitolojiya Newrozê behsa serketina qenciyê dike û şerê herdu xwedayê dîjraber dike. Ev efsane çend rast e, çawan e, ew-qas tê zanin. Lî baş dizanîn ku ev bûyer ji dî meha Adarê da pêk hatiye. Lî dawiyê da başî û xweşî serketiye, rojek nû destpêkiriye. Lewra mitolojiyê ji, ji vê roja qedirbilind ra gotiye newroz, nûroz, nûroj...

*Newroz, serketin e, kêf û seyran e
Her piroz be, ew ji Kurdan ra peyman e*

*Gaya em yekbin, êriş bîkin dîjmin
Dîbin xwedi tac û textê axa rengin*

*Navê Qasimlo, tu cari nabe jibir
Her cejnek gavektir bi pêş e, bi zanin û bir*

*Ji Çiyayê Ararat ta bigre Kirmanşan
Erd û axa Kurdan e, ew e Kurdistan*

*Elmedê Xani, Cigerxwin û Feqiyê Teyran
Sîrûda gotin, ji bo paşeroja gelê Kurdistan*



*Em kurê Medya û Keyxusrev in
Şerê me nasekine, hetani serkevin*

*Dema rizgar bû welat agir vêket li çiya
Bi mîzginiya azadiyê dakevin bajêr kesên geliya*

*Berzenci yekem bû, Berzani ya duwem, Qadi yê sisîyan
Îro li başûr Kurd bûne dewlet, ewê din hilweşîyan*

*Roja Newroz, bes bi rojek dîlşâ, qet nabîn qail
Têbikoşin herne pêş, rojan bikin xweş, reşî bibe zail*

*Dil birin û tir di cerg hiş û bir ji ser çû deran
Kurd hemi dilbirin in bi vê rewşê bêçar û hozan in*

*Dil birin û tir di cerg hiş û bir ji ser çû deran
Tenê rojek, ew ji cejn e, dil bi şâ ye, di Newrozan*

*Sahê cihan, bîke ferman, ji Kurdan ra bide derman
Ne şerm e qey, zîlm di çavan, barê giran li ser mulan.*

Newroz, bî kijan reng û mane bê zanin, disan ji li dawiyê her serketinek bibir tine. Kawa serket, Dehaq têşikest, roja reş rabû, roja xweş derket, xwedayê xirabiyan têkçû, xwedayê qenciyan serket. Dawiya van hemû bûyeran ji, zaferék dîde mîzgin. Îro bi giştî Kurd bende ne û ji azadi û xweşiyê bê par in. Serketin û zafer, iro ji hemû rojan zêdetur pêwist e ji Kurdan ra.

Qadi Mîhemmed dawiya meha Adarê şehid ket, disan di nivê paşin yê Adarek da bî hezaran kes li Helepê hatin kuştin. Roja yazdehê Adarê, roja xweserbûna Kurdên başûr e bi pêşengîya Mela Mistefa. Seidê Kurdi roja 24'ê Adarê çû ser heqiyê. Di Newroza çend sal berê da, li Kurdistanê gelek kes hatin kuştin. Zekiye Alkan keça hêja ya Kurd, bedena xwe ji Newrozê ra da agir. Li Cizira Botan, Nisêbin û Şîrnexê, beri du sal ji sedi zêdetur Kurd hatin kuştin di cejna Newrozê da.

Diyar e, di Newrozan da hinek caran xwin bariya ye. Gel dil bi xem û gîryan maye. Lê disan ji Newroz bî serbilindi û şerefendi her hatîye pirozkırın. Sal bi sal gavek bi pêş hatîye avêtîn hetani iro.

Bê guman isal ji di Newrozê da gavek pêştir wê bê avêtîn. Di şemûga dirokê da Newroz roja xweş û serketinê bûye, wer tê zanin. Wê wer ji bimine.

Agir, nişana Newrozê ye, remza azadiyê ye. Di Newrozan da Kurd li seranser agiran pêdixin, şen û ronak dîbarının, welat bî agirên Newrozê dîçilwîre. Kawa xwedi pêştemalek rengin bû ku dema çû serê Dehaq perçi-qand û ji gerdena Kurd şikand zincir. Ew pêştemala rengin iro ala ye ji Kurdan re. Tirêjên rojê li ser e, şewq dîde ala Kurdan bî maneya ronahi û xweşiyê. Hinek kesk e ew ji remza bereket û bîharê ye, aliyê din sor e rengê xwin û agir e ku azadi bê xwin û agir qet nabe.

*Berzenci û Qadi, Şêx Seid li gel Nûri
Li zinaran şop ajottî qehremanên Dêrsimi*

*Dema Simko, seri hilda nêzîk li Gola Ormiye
Digotin li Şîno, ta Xaneqîn agir vêketîye*

*Agirê Newrozê bi canê Zekiye Alkan bû ges
Ref bi ref, mil bi mil, keçno pêşkevin bimeş*

*Piremêrd û Qan'î û Goran û Ciziri
Helbestan dixwendîn bî terhek agiri*

*Baş guh bidin Kurdên welat, bizanîn gîhişte ku xebat
Li ser Kurdan pir mijûlbîn, bi ray û say û sebat*

*Kurdên jêri şarezabin wêne bigrin ji yêñ jori
Dem iro ye perwerdebin rojekî vala nebori*



16-17 Adara sala 1988'an Helepcê... Newroz şehit ket li Helepcê. Seddamê hov, bî bombeyen kimyayı bî hezaran Kurd kuşt û birindar kir. Bî dehhezaran Kurd ji koç kırın ji ber bombê kimyayı. Lê zêde ne ajot ev zilma bê perwa. Kurdên Başur iro dewletek çêkirin û kutayı bî zulma Seddam anin.

*Bê guman bî didema beşen mayi em dîbin dil bî şewat
Lê mîzgin bîdîn cihan Newroz û piroz disan hat*

*Hêvidar im cejneke din serbixwe bin, seranseri li Kurdistan
Herkes şa be, têr û tensax, ne berberi, ax û fîgan*

*Kesek ji me neke lome, me derd pir e, bî nalin in
Şev û rojan bî xebat in mebest ew e nir hilinun*

*Nine me qet tanqên bî top, li dawiyê bê sitar in
Lê dîzanin li cihanê ne tenê ne, bî heval in*


*Vê mesajê her roj wiha, bî gazi ne geli bîra
Guh bîdîn me, em tazi ne, bî jiyan in nav agira.*


Îsal ji dîvê weki hemi sala, Kurd şiyarbin li himberê hezarfendiya neyar. Tenê dî rojên wiha da ji hevkari û yekiti wek hewcehiyek mezîn xuya dike. Sedem vê yekê, bawer dikin ku hemû hêz û rêxistinê Kurdi, di bereyek azadixwaz de cih bigirin, rêzbin û nirê zordariyê bîşkênen. Newroz di gel hemû salixêne rewşa cihanê, salixê yekiti û tekoşinê ji dide. Lewra tekoşin û yekiti zexminê serxwebûn û azadiyê ye. Birati, aşti, hevkari û hevalbendi ji bo Kurdish agrîn pêwisteke. Bî vê bir û baweriyê cejna Newroz dî gel gelên Ari, her wiha li hemû cihan piroz be.

Piroz be Newroz li Kurdistan. /Kurdîno, cejna we piroz be,/ ji malan werin derê/ bî dîlsozi piroz bikin Newrozê.

Newroza me bî piroz
Hemû rojên we Newroz

(*)Ev helbesta dirêj ku li ser mane û naveroka Newrozê ye, ji aliyê Latif Epozdemir va hatiye nivisin.





AZADI

Sayınameye Hizmeti ve Məşəli Girməyə!

AZADI Gazetesi'nin özel ekidir parayla satılmaz

Süreç İnşaat Turizm ve Yayıncılık Tic. Ltd. Şti. Adına Sahibi ve Genel Yayın Yönetmeni:
İkramettin Oğuz • Sorumlu Yazı İşleri Müdürü: **Sedat Karakaş**

Adres: Atatürk Bulvarı Emlak Bankası Apt B Blok
No: 146 D 28 Aksaray / İSTANBUL

Baskı: Metinler Matbaası